



Pluttra - agahiyên ji bo dêbavan

Amûra belgeyan û agahiyên ya pêşdibistanê

Pluttra ji hêla Lin Educationê ve ji bo pêşdibistanan hatiye pêşxistin. Pluttra ji bo parvekirina belgeyan û agahiyên ya bi dêbavên li malê re platformeke dosta bikarhêneran e. Nivîs, wêne, deng û vîdyo cureyên van belgeyan in. Li gel ku ji bo Pluttrayê platformeke taybet ne pêwîst e, mirov dikare bi telefonên jîr, tablet û komputeran wê bi kar bîne.

Potansiyela Pluttrayê heye ku peywendiya di navbera pêşdibistanan û dêbavên li malê de xurt bike. Wekî dêbav, hûn dikarin kêliyên nava rojê yê zarokên xwe yê li pêşdibistanê bibînin, her wisa hûn dikarin bertekên mamosteyên têkildarî karê perwerdehiya pêşdibistanê bibînin. Hûn ê her wisa peyamên girîng jî wergirin û dê derfeta we hebe ku hûn ji bo bernamoyên komî bibin abone.

Girîng e ku hûn dêbav ji bikaranîna Pluttrayê ewle bin. Tenê hûn dikarin têkevin belgeyên zarokên xwe. Ewlekarî tişta herî girîng e ji bo Pluttrayê - hemû tiştên ku ji hêla pêşdibistanê ve bînin weşandin aîdî wan in û tenê xebatkarên pêşdibistanê û hûn dêbav dikarin xwe bigihînin.

Hûn ê hesabê xwe yê takekesî çawa biafirînin

- Pêşdibistan dawetnameyekê dişîne e-peyama we
- Li ser girêdanka di nav dawetnameyê de bitikînin
- Agahiyên xwe binivîsin û şifreyê hilbijêrin
- Paşê li ser nîşaneyê Pluttrayê bitikînin
- Gava pêşî ew e ku hûn bernamoka/appa dêbavan jêbar bikin

Bernamoka Pluttrayê

Hûn dikarin bernamoka ji bo Androidê ji Google Playê û ya ji bo iOSê ji AppStoreê jêbar bikin. Bernamok belê e. Bi şifreyê ku we di dema çêkirina hesabê xwe yê takekesî de diyar kiriye têkevin.

Ji bo ku hûn ji Pluttrayê çêtir fêm bikin, me hin film çêkirine ku hûn dikarin li vê derê peyda bikin (bi swêdî): https://www.youtube.com/playlist?list=PLYyf2_IH9nwcdzU9oWlseeavVpVOs1vi0

Alîkariya Pluttrayê

Tîma Alîkariya Pluttrayê bi swêdî û înglîzî diaxive.

Demjimêrên mesayiyê: nava hefteyê ji 08:00î heta 17:00î

E-Peyam: produktsupport@lineducation.se

Telefon: +46 (0)10-209 63 10

Ewlekariya Pluttrayê

Peydakarên me yê pêşkêşkarê PIN û Glesys in. Pluttra her şev tê yedekkirin û dane li Swêdê tên depokirin.

Di navbera pêşdibistanan û Lin Educationê de peymanek hatiye îmzekirin ku ev hesengiya li gel Qanûna Daneyên Taybet ya Swêdê pesend dike. Peymaneke kartêkirina daneyan jî di nav vê peymanê de ye. Ev peyman pesend dike ku em daneyan li gorî pêwîstiyên mercên têkildar diyar kirine dinixînin.

Têketin bi SSLê tê parastin, ku ev heman asta ewlekariyê ye ku banka û e-bazîrgan ji bo ewlekariya şifreyan bi kar tînin.

Hemû tiştên ku pêşdibistan li ser Pluttrayê diweşînin tenê ji mamoste û perwerdekarên pêşdibistanan re vekirî ne. Mafê hemû naverokên li ser Pluttrayê yê wekî wêne, vîdyo û deng aîdî pêşdibistanan in. Belgeyên ji bo zarokên takekes tenê ji bo bikarhênerên tîketine pergalê û bi komê ve hatine girêdan û ji bo dêbavên zarokan vekirî ne. Lîsteyeke lezgin ya referansan ji bo mamosteyên koman hêsantir dike ku bişopînin ka dêbavê kîjan zarokan destûra girtina wêneyên wan daye.

Ev agahî bi van zimanan heye: Swêdî, Înglîzî, Erebi, Farsi, Darî, Kurdî Kurmancî, Tigrînya û Somalî. Agahiyên zêdetir bi swêdî li ser vê malperê hene: <http://www.lineducation.se/pluttra>